Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :992 | 31-Tebax- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Di xwepêşandanên Bexdayê de 30 kes hatin kuştin

Serokê Tevgera Sedir Muqteda El Sedir, duh li ser malpera xwe ya twîterê peyamek belavkir. Sedir di peyama xwe de bi fermî ragihand ku ew êdî dev ji proseya siyasî berdide.



Piştî peyama Sedir alîgirên Tevgera Sedir li Bexdayê daketin kolanan, li gorî çavkaniyên ji Wezareta Tenduristiya Iraqê, şer di nava çekdarên Seraya Selamî ya ser bi Tevgera Sedir û hêzên ewlekariyê de qewimiye.

Heman çavkaniyê ragihand ku di encama şer û pevçûnan de 30 kes hatine kuştin û zêdetirî 390 kes jî birîndar bûne. Çavkaniyê da zanîn ku qurbanî ji her du aliyanin. ***ROJNEWS***

# NASA roketeke nû dişîne ser Heyvê

**NASA amadekariyê dike ku roja Duşemê roketeke nû bişîne Heyvê. Ji bo mirovan bibin ser Heyvê û vegerîne demeke dirêj e planan çêdike.**

NASA testekê plan dike ku kapsula personelan a Orîonê, bêyî ku kesek tê de hebe bişîne Heyvê û vegerîne. NASA piştî wezîfeya dawî ya sala 1972'an ji nû ve dest bi wezîfeyên Heyvê dike. Plan ew e ku heta sala 2025'an astronotan bişîne ser Heyvê. Wezîfeya destpêkê ya vê planê jî vê Duşemê saet di 08.33'an de destpê dike.

Di çarçoveya wezîfeyê de ku wê gava destpêkê ya bernameya Artemîsê be, NASA wê sîstema roketê ya herî xurt Space Launch System (SLS) û amûra fezayî Orîon a ku astronotan li nava xwe hildigire wê bi kar bîne. Ev wezîfe wê bêyî hebûna mirovan bi cih bê anîn.

**Çarçoveya wzîfeya Artemîs I:**

Artemîs I wê wezîfeya destpêkê ya Heyvê ya Artemîs be. Amûra fezayî ya Orîon wê bi roketa herî xurt a bi bilindahiya 98 metreyî, SLS bê şandin. Di dema wezîfeyê



de ku tê plankirin 4-6 hefteyan dewam bike, amûra fezayî Orîon wê bi 450 hezar kîlometreyî dûrî cîhanê biçe. Orîon bêyî ku xwe bi stasyona fezayî yan jî amûreke din a fezayî bigire, wê bi tena serê xwe biçe û eger her tişt li gorî planê bi rê ve biçe wê bê Cîhanê.

Ji bo firîna destpêkê ya bi mirov a sala 2024'an, wê ji bo wezîfeyên din astronot jî di hundirê amûrê de hebin. NASA plan dike ku astronotên destpêkê yên Artemîsê sala 2025'an deyne ser Heyvê.

Bi vê mîsyonê re wê lêkolîn bê kirin ku li ser Heyvê hin karên binesaziyê karibe bê kirin yan na. Her wiha wê lêkolîn bê kirin ku mirov karibin li gerstêrkeke din bimîne yan na.

Dema wezîfeyê 42 roj, 3 saet, 20 deqe ye û 10'ê Cotmehê beriya dakeve Okyanûsa Pasîfîk wê bi giştî bi 1.3 milyon mîl rêwîtiyê bike.

**Çima Artemîs?**

Navê bernameya destpêkê ya Heyvê ya NASA'yê Apollo bû. Artemîs di mîteolojiya Yewnan de xwişka cotik a Apollo ye û Xwedawenda Heyvê ***ye. ANF***

## Sudoku : 2

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | | | | | 4 | | | |
| | 5 | | 2 | 1 | | | | |
| 4 | | 6 | 7 | 3 | | 1 | | |
| 3 | | | | 9 | | 2 | | 5 |
| | 8 | | | 2 | | | 3 | |
| 2 | | 9 | | 7 | | | | 1 |
| | | 3 | | 5 | 7 | 9 | | 6 |
| | | | | 6 | 9 | | 8 | |
| | | | 8 | | | | | 7 |

## Bersiva Sudoku : 1

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | 2 | 5 | 1 | 3 | 9 | 7 | 6 | 4 |
| 9 | 3 | 7 | 6 | 8 | 4 | 2 | 5 | 1 |
| 1 | 6 | 4 | 7 | 5 | 2 | 3 | 8 | 9 |
| 7 | 5 | 3 | 4 | 2 | 6 | 1 | 9 | 8 |
| 2 | 4 | 9 | 8 | 1 | 3 | 5 | 7 | 6 |
| 6 | 1 | 8 | 9 | 7 | 5 | 4 | 3 | 2 |
| 4 | 7 | 1 | 5 | 6 | 8 | 9 | 2 | 3 |
| 3 | 9 | 6 | 2 | 4 | 7 | 8 | 1 | 5 |
| 5 | 8 | 2 | 3 | 9 | 1 | 6 | 4 | 7 |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | J | Î | ■ | L | A | L | O | T | E |
| 2 | I | L | M | ■ | D | A | ■ | Î | N |
| 3 | ■ | A | ■ | L | I | ■ | P | ■ | A |
| 4 | X | W | E | ■ | L | Ê | Z | I | M |
| 5 | A | E | ■ | Z | ■ | D | ■ | R | ■ |
| 6 | L | ■ | P | A | R | Î | S | ■ | D |
| 7 | ■ | B | A | L | E | ■ | I | R | A |
| 8 | F | A | L | ■ | N | E | N | A | S |
| 9 | E | C | E | M | Î | ■ | E | Z | ■ |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | | | ■ | | | | |
| 2 | | | | | | | | ■ | |
| 3 | | ■ | | | ■ | | | | |
| 4 | | | ■ | | | | ■ | | ■ |
| 5 | ■ | | | | | | | | |
| 6 | | | | ■ | | ■ | | | ■ |
| 7 | | ■ | | | | | | ■ | |
| 8 | | | ■ | | ■ | | | | |
| 9 | | | | | | | ■ | | |

**ÇEP-RAST**

1. Cureyekî xwînê... Ferişteyên bihuştê
2. (… Bedirxan) Kesê ku kovara Hawarê derxistiye û hîmê nivîsa kurdî ya bi tîpên latînî daniye
3. Îşaret, şop... Nexweşîneke çerm e ku bi taybetî di gewde, çîm û rû de wekî kelepotkan xwe dide nîşan
4. Notayek... Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin
5. Kesê ku di daweta zavê de xwedîtiya wî dike
6. Sala borî... Notayek
7. Her tiştê têkildarî debara jiyanê
8. Dema mirov şîr bidoşe û dest nedê tebaqeya bi ser dikeve, qeymax... Ji bo gotin û biwêjên taybet ku ji aliyê civat an jî kesên serserî ve tên bikaranîn
9. Di filehtiyê de cezayê avêtina ji cemaetê... Agir

**JOR-JÊR**

1. Vê carê... Wekhev
2. Qumaşê ku ji hiriyê çêdibe... Baneşana bêhntengiyê
3. Teref... Kurteya rêxistina rizgariya Îrlandayê
4. Danûstandin, kirîn û firotin... Sarincên avê yên di binê erdê de
5. Kinceke zivistanî ya stûr e û hetanî ser lingan dadikeve
6. Ji binî ve herikîna axê... Sir, tiştê her kes pê nizane
7. Kurtebêja otomobîlê... Kesê ku di karekî de xwedî rayeya fermankirinê ye
8. Kurê zarokê mirovekî... Dewara nêr
9. Pêxemberek... Xwarina ku xwêya wê zêde ye

# 'Ewlekariya jin pêşengiya Operesyonê dike`



Rêvebera Ragihandina Hêzên Ewlekariya Hundirîn ya herêma Cizîrê Nalîn Ebdilqadir da zanîn ku armanca wan ji pêngava Operesyona 'Mirovî û Ewlehiyê` ew e ku ewlehî û aramî li kampê çêbibe. Herwiha got, emê hewil bidin ku teybet jinên kampê yên di bin metirsiya DAIŞ'ê de bi ewletir bikin. ***R-2***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 992 | 31-Tebax- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# RÊYA DAGÎRKERAN MIRIN E!



## 'PDK'ê ji bo berjewendiyên xwe dibe rêya qirkirina Kurdan'

Hediya Şemo diyar kir ku hevkariya PDK'ê bi dagîrkeriya tirkî re hebûna Kurdan dixe xeteriyê û got, divê gelê Kurd li herçar perçeyên Kurdistanê li dijî xiyaneta PDK'ê helwesteke xurt nîşan bidin ***R-4***

## 'Nebe hevkarê dagîrkerê xaka xwe'




Luqman Jaro diyar kir ku armanca êrişên dagîrkeriya tirkî şkandina baweriya gelên herêmê ye û got, divê rejîma Şamê nebe hevkarê dagîrkerê xaka xwe.R-5

## KÊLIYA KU CIVAK XISTINE NAV QEFESA JI HESIN

**Zozan Cizîrî**

...Bi pêşdîtineke herî bilind Rêber Abdulah Ocalan wiha destnîşan dike; "Wekî kesê bi xwe li defê dixe û bi xwe li ber dilîze, (hêzên desthilatdar) dikarin civakê bê polîtîka û bê exlaq bihêlin. Lê wê çaxê jî, civak ji aliyê Levîathanê nû (faşîzma netewe-dewletê) ve tê parçekirin û daqurtandin ku, kêliya mirina civakê û însan jî wisa dibe mijara temaşekirinê. Ev kêlî, ew kêlî ye ku qirkirin hatiye pêkanîn. Ev kêlî, ew kêlî ye ku, Mîchel Foucault ev wekî mirina însan îlan kiriye. Ev kêlî, ew kêlî ye ku Frîedrîch Nîetzsche gotiye civak û însan hatine xesandin, kirine wek qambost û moriyan, civak û însan wek kerî û girseyan îlan kirine. Bi gotina M. Weber, ev kêlî ew kêlî ye ku, civak xistine nav 'qefesa hesinî'."...R-2

## `Çeteyên DAIŞ`ê yên Holê bi rênîşana dewleta tirk tevdigerin`



Cîhan Henan da zanîn ku çeteyên DAIŞ`ê birênîşana dewleta tirk ya dagîrker aloziya di Kampa Holê de derdixînin. Herwiha li gor belgeyên ku di operesyonê de hatîn bi bi destxistin, kiryarên DAIŞ'ê yên li kampa Holê bi kordineya dewleta tirkî ya dagîrker tên kirin.R-2

## AKP'ê bi 'qanûnan' dest daniye ser peravên Gola Wanê



Berdevkê Ekolojiya Zîlan Mîr Bahattîn Demîr ragihand ku hewl tê dayin, dagirkeriya li derdora Gola Wanê bê mayindekirin û pêşî li têkoşîna hiqûqî û dozan bê girtin. ***R-6***

## KCK: Êrişa li dijî hevrê Sûheyl Xûrşîd parçeyek ji qirkirina Kurdan e



KCK'ê da xuyakirin ku wê gelê Kurdistanê yê welatparêz bide ser şopa têkoşer Sûheyl Xûrşîd û xwedî li mîrateya wî derkeve û got, zêdebûna êrişan parçeyek ji qirkirina Kurdan e. ***R-3***


## HPG: 8 dagirker hatin cezakirin, derb li Skorskyekê hate xistin...R-3





Dost ji Erdogan re tune... R-4
DILYAR CIZÎRÎ

Tirkiye navendbûyîna... R-5
Zekî Bedran



Kewê Ribat Silêmanê ... R-7
Sîpan Şînda

SEBRA EREBİ BERXWEDAN'A... R-6
Hafiz Ahmet Turhallı

# ‘Ewlekariya jin pêşengiya Operesyonê dike`

Rêvebera Ragihandina Hêzên Ewlekariya Hundirîn ya herêma Cizîrê Nalîn Ebdilqadir da zanîn ku armanca wan ji pêngava Operesyona ‘Mirovî û Ewlehiyê` ew e ku ewlehî û aramî li kampê çêbibe. Herwiha got, emê hewil bidin ku teybet jinên kampê yên di bin metirsiya DAIŞ’ê de bi ewletir bibin.

**Medya Xanim/Hol**

Ji ber zêdebûna kiryarê şaneyên çeteyên DAIŞ`ê û tinebûna Ewlehî û aramiyê li kampa Holê, Hêzên Ewlekariya Hundirîn bi piştgiriya QSD, YPG/YPJ`ê 25`ê Tebaxê dest bi Qonaxa duyemîn ya Pêngava Operesyona ‘Mirovî û Ewlehiyê` li Kampa Holê kir. Heta niha jî pêngav didome. Herwiha di dema paqijkirin û lêgerîn de gelek kort û tûnelên DAIŞ’ê hatin dîtin. Di wan kortan de cenazeyên kesên ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê ve hatine kuştin, hatibûn veşartin. Ji bilî wê jî çek û amûrên ku çeteyên DAIŞ`ê ji bo kuştinê bi kar tînin, di wan kortan de hatin dîtin. Lê di pêngava ’Mirovî û Ewlehiyê’ de, ev kort û tûnel ji aliyê hêzên di operasyonê de cih digrin, hatin bêbandorkirin.



Hêjayî bibîrxistinê ye ku Hêzên Ewlekariya Hundirîn di 28`ê Adara 2021`an de qonaxa yekem ya Pêngava `Mirovî û Ewlehiyê` dabû destpêkirin û di 2`yê Nîsana heman salê de bi dawî kir. Di encamê de 125 çeteyên veşartî yên DAIŞ`ê hatibûn girtin ku 20 ji wan serçete bûn. Niha jî pêngava duyem li kampa Holê hatiye despêkirin û hê jî dewam dike.

Derbarê pêngava Operesyona ‘Mirovî û Ewlehiyê` ya li kampa Holê de, rêvebira ragihandina Hêzên Ewlekariya Hundrîn ya herêma Cizîrê Nalîn Ebdilqadir ji me re axivî û nêrînên xwe anî ziman.

**`Ewlekariya jin pêşengiya Operesyonê dike`**

Nalîn Ebdilqadir da zanîn ku pêwîstî bi destpêkirina vê pêngavê hebû û axafdtina xwe wiha domand: “Ji ber ku gelek pirsgirêk û alozî li kampê derdiketin, herwiha rojbiroj xeterî li kampê zêde dibû, me pêwîstî bi pêngaveke duyem ya ’Mirovî û Ewlehiyê’ dît. Ji bo wê jî niha me pêngav daye destpêkirin, herwiha emê pêngavê dewam bikin û tevayiya beşên kampê kontrol bikin.”

Nalîn diyar kir ku hêza Ewlekariya jin bi piştgiriya YPJ’ê pêşengiyê ji vê operasyonê re dikin. Herwiha da zanîn ku çeteyên DAIŞ’ê xwe di bin cilên reş yên jinan de vedişêrin û got, ewlekariya jin pêşengiyê dike ku planên çeteyan yên veşartî derkevin holê û jinên DAIŞ’î jî tespît dikin.

**`Wê kiryarên DAIŞ`ê bi dawî bibin`**

Nalîn bîr xist ku armanca wan ji vê



pêngavê ew e ku ewlehî û aramî li kampê çêbibe û axaftina xwe wiha domand: “Ji ber ku çeteyên DAIŞ`ê jiyana tevayiya koçberên li kampê xistibûn xeterê de, bi taybet jinên DAIŞ’î ku liv û tevgera wan li kampê zêde bû, ewlehî di hundirê kampê de nemabû. Herwiha Kûştinên ku çêdibûn jî, piraniya wan li ser destê jinên DAIŞ’î bûn. Rojane jin li ser destê jinan dihatin kuştin. Ji bo wê jî bi rêya vê pêngavê, em ê hewl bidin ku van pirsgirêkan kêm bikin û aramiyê bixin dilê koçberên li kampê.”

Rêvebira ragihandina Hêzên Ewlekariya Hundirîn ya herêma Cizîrê Nalîn Ebdilqadir di dawiya axaftina xwe de got, pêngava Operesyona ‘Mirovî û Ewlehiyê` wê aramî û ewlehiyê li kampê çêke. Herwiha emê hewl bidin ku kiryarên şaneyên çeteyên DAIŞ`ê li dijî koçberên kampê pêk tên, bi dawî bibin.

# `Çeteyên DAIŞ`ê yên Holê bi rênîşana dewleta tirk tevdigerin`

**Darîn Silê/Hol**

**Cîhan Henan da zanîn ku çeteyên DAIŞ`ê birênîşana dewleta tirk ya dagîrker aloziya di Kampa Holê de derdixînin. Herwiha li gor belgeyên ku di operesyonê de hatîn bi destxistin, kiryarên DAIŞ’ê yên li kampa Holê bi kordineya dewleta tirkî ya dagîrker tên kirin.**

Piştî ku şervanên YPG-YPJ û QSD`ê bajarê Baxozê ji çeteyên DAIŞê rizgar kirin, di 2018`an de ji bo bicîkirina malbatên çeteyên DAIŞ’ê yên ku xwe radestî Hêzên Sûriya Demokratîk kirîn, Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê û rêxistinên mirovî li bajarê Holê, kampeke bi navê Hol ava kirin. Ev kamp li bakur û rojhilatê Sûriyê kampa herî mezin û ya herî bixeter e. Herwiha çavkaniya terora cîhanî ye. Ji ber ku bi hezaran çeteyên DAIŞ`ê lê hene, Ji bilî wan jî koçberên Mûsil, Iraq û yên Sûrî jî lê dimînin.



Ji destpêka avakirina kampa Holê ve, ji ber hişmendiya DAIŞ’ê, pirbûna koçberan û hebûna koçberên ji welatanên cûda, li kampê her tim alozî û pirsgirêk derdikevin. Hata niha jî ev alozî dewam dikin. Yên ku aloziyê jî çêdikin çeteyên DAIŞ`ê ne. Rojane koçberên li Kampê dijîn, ji aliyê şaneyên çeteyên DAIŞ`ê ve tên kuştin û bûyerên dijmirovî derdikevin holê. Herwiha çete hewl didin ku fikrê xwe yê qirêj li kampê belav bikin û perwerdeyên fikrî didin zarokan. Kesê ku li dijî fikrê wan jî derdikeve, li ser destê wan tê kuştin.

**`Xreterî her ku diçe kûr dibe`**

Derbarê rewşa kampa Holê û xeteriya wê de rêvebira Kampê Cîhan Henan, da zanîn ku çeteyên DAIŞ`ê xeteriyeke mezin li ser jiyana koçberên li kampê çêkirine û axaftina xwe wiha domand: “Ji destpêka ku kamp hat avakirin, çeteyên DAIŞ`ê lê hatin bicîkirin. Van çeteyan ji xwe re bingehek di hindirê kampê de ava kirin û rojbiroj fikrê xwe belav kirin, heta ku xwe birêxistin kirin. Bi vî awayî xeteriya wan li kampê mezin bû û bandoreke pir mezin li kesên ku di kampê de dijî hat kirin. Teybet jî li ser jin û zarokan. Ev xeterî her ku diçû kûr dibe, rojane bûyerên kûştinê li kampê çêdibin. Ji ber wê jî em zehmetiyan ji vî alî ve pir dikşînin.”

**`Îsal rewş pir zehmet bû`**

Cîhan diyar kir ku di dema dawî de rewşa kampê ji bin kontrolê derketibû û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Sal bi sal rewşa kampê xirabtir dibû û bûyerên kuştinê zêdetir dibûn. Bi taybet îsal rewş pir zehmet bû û rojane kesên li kampê ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê ve dihatin kuştin. Herwiha ji destpêka vê salê




ve 31 bûyerên kuştinê çêbûn û her bûyerek ji yan din cûda bû.”

Cîhan da xuyakirin ku êrişên dewleta tirkî ya dagîrker bandorê li rewşa kampê jî dike û wiha pê de çû: “Her ku Tirkiyê êrişî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dike, çeteyên DAIŞ`ê yên li kampê jî derfetên wan yên pêkanîna kiryarên qirêj zêdetir dibûn. Çawa ku Tirkiyê êrişî herêmên me dike û kiryarên qirêj pêk tîne, rênîşaniya çeteyên li kampê jî dike ku kiryarên hovane derheqê koçberên li kampê pêk bînin.”

**`Çeteyên DAIŞ’ê xeterin ji bo cîhanê giş`**

Rêvebira kampa holê Cîhan Henan di dawiya axiftina xwe de bang li dewletên derve kir ku bi bi erkê xwe re rabin û her dewletek welatiyên xwe yên di nav DAIŞ`ê de bigre gel xwe, da ku alozî û pirsgirêk li kampê nemînin û koçberên li kampê jî bi aramî û ewlehî bijîn. Herwiha bibîr anî ku ev xetere li ser cîhanê giştiye.



**KÊLIYA KU CIVAK XISTINE NAV QEFESA JI HESIN**

Zozan Cizîrî

Roja îro ku hêzên sereke yên Şarîstaniya Sermayedar bi hemû hêza xwe hewl didin deşthilata xwe li ser tevahî gelên cîhanê serwer bikin, şer û berberî kirine rojeva esasî ya tevahî cîhanê. Mirov li kîjan aliyê cîhanê dinêre, dengê şer bilind dibe. Welatên bi aramî jiyan dikirin, îro ew jî fetilandine meydanên xwe yên cengê. Rojane hemû beşên ragihandinê yên ser bi dewletan, bi giranî behsa şer dikin. Her sibehê ku em li rûpelên rojname û malperan dinêrin, nûçeyên deştpêkê dikevin ber çavan; “di navbera Amerîka û Rûsya de şerê li ser deşthilata cîhanê”, “li Îranê dorpêça hêzên navdewletî”, “li Iraq û Sûriyê şerê dagirkeriya dewleta Tirk û pirsgirêkên navxweyî yên li ser deşthilatê”, “li Ûkrayna şerê berberiya dewletan”, “şerê dewleta Tirk û Yûnanîştanê”, “milmilaniya navbera Çîn û Teywanê” û hwd. ev rojev li pey hev rêz dibin, heta rojane derî li şerên nû vedikin.

Di nava van şeran de rewşa gelan çi ye, gel tên kuştin-tên qirkirin, civak têr inbirçî ne, welat wêran dibin, xelk koçber dibin, hejar in, çi dixwazin; qet li xema wan nîn e. Jixwe rojevên dilxwede bi navê ‘çareseriyê’ gotûbêj dikin, şer û qeyrana heyî kûrtir dikin. Di encama van şer û aloziyên hêzên netewe-dewlet û hêzên Sermayedarên Cîhanê de tevahî gel dinalin, bi milyonan însan ji ser warên xwe bûne, derbeder bûne, tu hêzek guh nadiyê!

Di vir de em careke din wekî lêgerîna civaka azad û demokratîk li ramanên Rêber APO vedigerin ku, rêya hêvî û çareseriyê li ser bingeha avakirina civaka exlaqî û polîtîk xiştiye deştê jinan û civakê. Bi pêşdîtineke herî bilind Rêber Abdulah Ocalan wiha deştnîşan dike; “Wekî kesê bi xwe li defê dixe û bi xwe li ber dilîze, (hêzên deşthilatdar) dikarin civakê bê polîtîka û bê exlaq bihêlin. Lê wê çaxê jî, civak ji aliyê Levîathanê nû (faşîzma netewe-dewletê) ve tê parçekirin û daqurtandin ku, kêliya mirina civakê û însan jî wisa dibe mijara temaşekirinê. Ev kêlî, ew kêlî ye ku qirkirin hatiye pêkanîn. Ev kêlî, ew kêlî ye ku, Mîchel Foucault ev wekî mirina însan îlan kiriye. Ev kêlî, ew kêlî ye ku Frîedrîch Nîetzsche gotiye civak û însan hatine xesandin, kirine wek qambošt û moriyan, civak û însan wek kerî û girseyan îlan kirine. Bi gotina M. Weber, ev kêlî ew kêlî ye ku, civak xiştine nav ‘qefesa hesinî’.” Ango Modernîteya Kapîtalîşt ji bo berjewendiyên xwe yên deşthilatê, bi giştî civak û mirov xiştine nava qefeseke ji hesin.

Li hemberî van heqîqetên ku roja îro li ber çavên tevahî cîhanê tên jiyîn û em hemû civak jê bêzar bûne, niha gava herî rašt israra di xebata avakirina civakeke demokratîk û azad de ye. Ango weke jin û giştî civak, şert e em li hemberî hemû ferzkirinên şer û berberiyên hêzên netewe-dewletan û deşthilatdaran rojeva xwe ya civakî-jiyanî ava bikin, ferz bikin. Di vê wateyê de îro li Rojavayê Kurdiştanê û Bakur-Rojhilatê Sûriyê her meşeke civakê ya bi tevlîbûna jin, zilam, zarok, ciwan tevî hemû pêkhateyên civakê xwedî wateyek kûr e. Ev sekneke birûmet e ku, çavkaniya xwe ji ruhê berxwedêr û sazkar ê çanda Neolotîkê ya Dayika Xwedawend digire. Belku çavên bi pere û berjewendiyên deşthilatdariyê kor bûyîn vê raštiyê nebînin, lê sekna heyî nîşana serkeftina hêza jin û civakê ye. Di vê wateyê de rêya aştî, çareserî û aramiyê esas bi deştê hêzên azadîxwaz û demokratîk vedibe.



# Yek ji çandên kevnar: Gewlaz

Civaka Êzidî bi amûr û rêbazên bav û kalan hem debara jiyana xwe dikin û hem jî nahêlin çanda kevnar winda bibe. Şêniyên gundê Warê Xidirê Xwedêda Xelef ji xwedî çanda xwe derketiye û dibêje: “Me biryara xwe da, emê warê xwe terd nekin.”



Li ser rûyê erdê kêm civak wek civaka Êzidî hene ku xwedî çand û baweriya kevnar in. Êzidî girêdanbûyîna xwe ya bi ax û çanda xwe ve tên nasîn. Ev rihê parastinê hiştiye ku civak heta roja me ya îro çand û baweriya xwe bide jiyankirin. Gelek amûrên kevnar di nav modernîteya kapîtalîst de winda dibin. Lê tevî hewildanên tinekirina çanda kevnar hîn jî gelek deverên Şengalê xwedî çand û baweriya xwe derdikevin. Yek jî malbata ku ji gundê Warê Xidirê malbata Xwedêda Xelef e.

Gundê Warê Xidirê yek ji gundên Geliyê Kersê ye. Geliyê Kersê ku dikeve başûrê Çiyayê Şengalê, ji bo çandiniyê cihê ku herî guncave. Ev gund bi fêkiyên xwe yên weke hêjîr, hinar, tirî û bi tutinê tê nasîn. Xwedêda Xelef jî yek ji wan kesên ku tevî hemû zehmetiyan çanda xwe parastiye û bi vî kevneşopiya bav û kalên xwe re debara xwe dike. Xelef wiha behsa karên xwe dike: “Em ji mêjde karê hêjîran dikin. Berê bav û bapîren me jî ev kar dikir. Wextê çêbûna hêjîra heye. Di mema Tebaxê de hêjîr çêdibe, heta meha Cotmehê hêjîr dimînin. Dema hêjîr zer dibim em ji darê kom dikin û ber tavê radixin. Demek şunda ew hêjîr hişk dibe. Piştî ku hêjîr hişk bû, hêjîrên biçûk û mezin ji hev cuda dikin. Niha em wan hêjirên mezin re dibêjin hêjîrên gewlaza. Em hinek hêjîrên biçûk dikin serok (hêjîra hûr dikin û dixin qalibekî hişk dikin. Ji ber ev hêjîrên herî xweşin Êzidî vî navê lê kirine), hineka jî didin kargehan. Ji wan biçûktir jî em dibêjin hebhebê hêjîra, wan jî an em didin dostên xwe an jî li bajarê difroşin.”

**Bi riya heskirinê çanda xwe parastin**

Xwedêda Xelef behsa çêkirina gewlaza kir û wiha domad: “Bi alîkariya şûjina gewlazê em hêjîran bi tave dikin. Dema mirov hêjîra lib lib bi şûjinê dike, ji bo hêjîr pêve nezeliqe, em şûjinê carna dixin di nav avê de. Pêwîste qiyasa hêjîr û ta weke yek be. Ger hêjîr girbin pêwîste ta jî stur be. Li gor qiyasê digihure. Piştî me hêjîra li ser ta rêz kir, em dibin di bazaran de difroşin.”

Xelef diyar ku ew ji bavê xwe ferî vî karî bûye û wiha dewam kir: “Çiyayê Şengalê berê hemû darên hêjîr, hinar û tirî têde hebûn. Di Şengalê de gelek kes xwedî rez bûn. Ji zarokatiya xwe heta niha ez vî karî dikim. Bav û bapîrên me jî vî karî dikirin. Em li ber destê wan ferî vî karî bûn û heta niha jî berdewam dikin. Em karê hêjîra hez dikin, kêfa me ji karê me tê.”

Xelef û malbata wî debara xwe bi vî karî dikin. Lê, ev kar ji bo debara malekî ne têrkere. Di gundê Warê Xidirê de gelek malbat hene ku bi vî karî re debara xwe dikin. Lê ji ber ku rezên wan malbatan kêmin qezanca wan terê malbata nake.

**‘Em ji halên xwe razîne’**

Xwedêda Xelef behsa kêmahiyên gund kir û destnîşan kir ku ew kêmahiyên hene ji bo karê wan astengî çêdike û wiha pêde çû: “Gelek pêwîstiyên gund hene. Ceyran, rê û ava gund pirsgirekin. Heta niha çi hikûmeta Iraqê û çi jî hikûmeta Kurdistan alîkariya me nekirine. Gelek berpirs hatin gel me û rewşa me mêzekirin. Gotin emê alîkariya we bikin, lê heta roja me îro jî ji bo me tiştek nekirine. Şeniyên gund bi xwe ji kîsê xwe rêya gund çêkirin.”

**‘Em ê dest ji warê xwe bernedin’**

Xelef di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku ew çi zehmetî hebe jî dest ji axa xwe bernadin û got: “Tevî ewqas zor û zehmetî jî em ji halê xwe razîne. Em di axa xwe de ne û ev kar ji me re şerefeke. Ji fermanê heta niha me terka vî axê nedaye û em nadin jî. Ev der erdê me, milkê me ye, me xwe pêve girtiye. Me biryara xwe da, em cihê xwe terk nakîn.”

***ROJNEWS/ ŞENGAL***

## Kewê Ribat Silêmanê Sofî

Sîpan Şînda



Botan warê dengbêja ye. Serkaniya miqam û serhetîya ye. Warê evîn û evîndara ye. Çiya û zozanên Botanê her tim bûne war û warkozê nêçîrvanan. Dengê dengbêjan li Kûçke û dîwanxanên Botanê her tim bilind bûye. Yek ji van dengên ku di kûçke û dîwanxanan de bilind bûyî jê Silêmanê Sofî ye. Ew weke kewê ribat e. Dema wî deštê xwe dibir li ber guhê xwe û qîr dikirê, te digot qey kewê ribat e, di şefeqa sibê de li nêvsera çiyayê Cûdî di xure. Hingî ew di xurî dengê wî pitir vedibû û aztir dibû. Ew miqambêjekî giranbiha û dengbêjekî hêl e ku ji nava dilê çiyayên Kurdištanê û war û wargehên Mîr Bedirxan derketî ye.

Silêmanê Sofî, temenê wî niha 74 sal e. Ew ji eşîra Batû ya, ji gundê Zêwigê yê girêdayî Dêrgulê li ser Şernexê ye. Ew kurê Sofî yê Haşim e. Bav û bapîrê wî jî dengbêj bûne. Lê belê hêj ew biçûk bû ku bavê wî diçe li ser dilovaniya xwidê. Ew li cem bapîrê xwe mezin dibe û ew dengbêjî û miqamên xwe jî ji bapîrê xwe fêr dibe. Heta ew li gund bû, ewî bi şivanî û cotyarî yê debara xwe dikir. Piştî gundê wan di salên 1990’î de ji aliyê dewletê ve tê xirabkirin, ew li Dêrgulê bi cih dibe û ji xwe re emaletiyê dike û zarokên xwe xweyî dike.

Ew di ciwaniya xwe de xortekî gelekî keyfîn û ehlê keyfê bûye û ewî gelekî ji keyf û şahiyan hez dikir. Ji ber wê keyf û şahiyek li




kû çêbûya ew li wir bû û bi deng û miqamên xwe ewder geş dikir. Ew dibêje; ‘li nav Batûyan çi dawet ji bêyî wî çênedibûn. Ez her tim xweštiyê dawetan bûm, min şal û şapikê xwe yê kixme werdigirt û di dawetan de min bi dengê xwe yê xweş miqam digotin’. Ew dibêje, dema ez ciwan bûm dengê min weke têlên qesemê bû, ewqasî az û xweş bû. Ji ber wê dema ez diçûm daweta, keçik hema li dora min diçûn û dihatin. Ew piştî 30 saliya xwe diçe leşkeriyê û dema ew li leşkeriyê bandekê li ser xwe dadigire. Dîsa wî gelek band ji xelkê re dagirtîne.

Ewî gelek štran ji Mihemed Arif û Hesen Cizîrî, Kerepêtê Xaço, Îsa Berwarî û Hesen Kirûrî girtine. Lê belê ewî her pitirê xwe miqamên Botanê weke payîzok, heyranok, bêlîte, giranî, bûlik, biharûk û hwd gotine. Bi raštî ji ew miqamê štranê yê resen diparêze û ji ber wê kêm dengbêj niha hene ku bikaribin weke wî miqamên kevin derbêxine. Mînak štrana Hesamê Axê yan ji ya Mezûlî yê; gelo çend dengbêj niha dikarine weke wî miqamî xira neke û bêje? Ew î bi gelek dengbêjên herêma Botanê yên weke Salihê Şirnexî, Cemalê Mihê, Rêzanê Batû re di civatan de štran gotine. Gelek bend li ser payîzok û biharûkan ve zêde kirine. Dibêje min jiyaneke gelekî xweş derbas kiriye. 12 zarokên wî hene, 6 kur, 6 keç. Zarokên wî ji gelekî dengê wan xweş e. Keça wî Nûdem jî dengbêje, lê mixabin ev 5 sal in di girtîgehê de ye. Kurekê wî di salên 1990 î de dixwaze biçe bibe hunermendê tirkî, lê ew deštûrê nade wî. Xwidê heylê te xweş û jiyê te dirêj bike, Silêmanê Sofî.

## Li Hesekê di pêşangeha şêwekariyê de 10 kes hatin xelatkirin

**Tevgera Hîlala Zêrîn bi hevkariya Komîteya Çand û Hunerê ya kantona Hesekê, 10 beşdarên pêşangeha şêwekariyê xelat kirin ku bi armanca pêşxiştina behreyên jinên ciwan û zarokan li dar ketiye.**

Tevgera Hîlala Zêrîn a Çanda Jinan bi hevkariya komîteya Çand û Hunerê ya kantona Hesekê bi armanca pêşxiştina behreyên jiên ciwan û zarokan pêşangeha şêwekariyê Bi dirûşma “Afirîner îsrar û îradeyê diafirînin” li dar xišt. Dayîka du şehîdan Bengîn û Hozan Xezale Dawûd pêşangeh vekir ku tê de malbatên perwerdekeran û endamên Navenda Çand û Hunerê ya kantona Hesekê beşdar bûn.



Di deštpêka pêşangehê de endama rêveber a Hîlala Zêrîn Yasmîn Xelîl wiha axivî: “Em lidarxiština vê pêşangehê li hemû beşdarên ku perwerde dîtine pîroz dikin û di qonaxa duyemîn a piştî vê qonaxê de serkeftinê ji wan re dixwazin.”

Piştre, berdevka Komîteya Çand û Hunerê ya kantona Hesekê, Efaf Hesekê wiha anî ziman: “Dewleta Tirk a dagirker hewl dide bi hemû awayan jin û zarokên me hedef bigire; lê çiqas hewl bide jî ew ê berxwedana me têk nebe û em ê bi çand û zanabûna xwe hemû cureyên dagirkeriyê têk bibin.”

Piştî bidawîbûna axaftinan bawername li perwerdekerên pêşangehê ji aliyê şêwekar û perwerdekara Hîlala Zêrîn Canda Ebdulqadir ve hatin belavkirin.

Canda Ebdulqadir ji ajansa me re wiha axivî: “Me ev pêşangeh ji bo xwedîderketina li behreyên jinên ciwan û zarokan û pêşxiština wan li dar xišt. Îro 10 hunermend piştî 9 meh ji perwerdekirina wan li ser zirîç û textê, hatin xelatkirin.”

***ANHA***

# AKP’ê bi ‘qanûnan’ dest daniye ser peravên Gola Wanê

Berdevkê Ekolojiya Zîlan Mîr Bahattîn Demîr ragihand ku hewl tê dayin, dagirkeriya li derdora Gola Wanê bê mayindekirin û pêşî li têkoşîna hiqûqî û dozan bê girtin.

Li navçeyên Bêgir, Westan, Rêya Armûşê, Tûşba û Erdîşê yên Wanê û li navçeyên Tetwan, Adilcewaz û Tetwanê, gelek saziyên dewletê peravên Gola Wanê dagir kirine. Li perava Artemêtan, Westan, Erdîş û Bêgirê, gelek saziyên taybet kafe û restoran vekirine. Hema bêje temamiya van kargehan ên hevkarên AKP’ê ne. Gola Wanê û derdora wê, ku veguheriye qada rantê, di bin xizmeta dewletê û saziyên wê de ne.

**Xelk Nikare Bikeve Golê**

Li peravê Gola Wanê yê li navçeya Xelat a Bedlîsê, ‘Qesra Ahlat’ê ya AKP’ê heye. Li peravê Gola Wanê yê li navçeya Bêgirê jî ‘Atayûrt Otagi’ heye ku Tirkan temsîl dike. Peravên Gola Wanê yên li nêzî navenda Wanê jî ji ber ku ji aliyê saziyan ve hatine dagirkirin, qedexe ye ku xelkê bajêr bikeve golê. Xelkê Wanê ji bo karibin bikevin Gola Wanê neçar dimînin ku biçin deverên bi 40-50 kîlometreyî dûrî navenda bajêr.

**Perav Malê Cemaweriyê Ye**

Berdevkê Ekolojiya Zîlan Mîr Bahattîn Demîr ji ANF’ê re axivî û bi bîr xist ku di Xala 43’an a Destûra Bingehîn de tê gotin, “Perav malê cemaweriyê ye, di bin hikumê dewletê de ye” û got, li gorî Qanûna Peravî ya bi hejmara 3621’ê, peravên derya, çem, gol û golên çêkirî, hebûneyên çandî û xwezayî yên peravî di bin parastina dewletê de ne, nabe ku avahiyek lê bê çêkirin an jî bend bê danîn. Demîr anî ziman ku li gorî ‘Qanûna Parastina Gola Wanê’ ya ku nû hatiye amadekirin, çarçoveya qada sîtê hînê diyar nebûye û got, “Bicihanîna xala bikaranîna bi kontrol û parastina herdemî, qanûneke parastinê ya bi pirsgirêkan dagirtî ye. Ya esasî ew bû ku qada hesas a divê teqez bê parastin, bihata ragihandin. Peravên Gola Wanê salên dawî hatine dagirkirin. Sazî binpêkirina xala Destûra Bingehîn, li peravan avahiyan lêdikin. Li hemberî van kiryarên ku qanûna peravê binpê dike, rêxistinên hawirdorê doz vekirine, her wiha amadekariyê dikin ku dozên nû vekin. Lê belê bi vê qanûna parastinê ya nû re tê xwestin ku cihên hatine dagirkirin mayinde bibin, pêşî li dozên hatine vekirin û têkoşîna hiqûqî bê girtin. Ji ber ku ji bo her avahiya li peravê çêkirine û qad dagir kirine, di bin navê ‘bikaranîna bi kontrol’ de wê karibin gotinekê ji xwe re bibînin û xwe pê biparêzin.”

Çem Têne Gemarîkirin

Demîr bi bîr xist ku yek ji 104 çemên bi ser Gola Wanê ve diherikin, ya herî mezin Çemê Zîlanê ye, lê belê gemara 20 gundan diherike nava vî çemî û got, “Ev gemar jî bi çem re diherike nava Gola Wanê. Tevî ku me ji saziyan re ragihandin, tiştek nekirin. Ji ber vê xemsariyê li gundên li Tejaneya Zîlanê bi derfetên xwe kolandina fosseptîk dikim.”

**Kafe û Kargehên Alîgirên Desthilatdariyê**

Demîr destnîşan kir ku di vir de pirsgirêka esasî qanûna parastinê ye ku rê dide çêkirina kafe û kargehên alîgirên desthilatdariyê û wiha dewam kir, “Eger xala Destûra Bingehîn tê binpêkirin, hingî ev statuya parastinê jî wê bi kêr neyê, ji ber ku pratîk li holê ye. Ji xwe ji ber krîza avhewayê mîkrobiyolîtên bi hezaran salî derketine ser rûyê avê. Gola Wanê bi halê hazir di rewşeke metirsîdar de ye. Li qiraxa çeman ji bo zêdekirina kapasîteya kanên xîzê, walîtiyan rapora ‘Pêwîstî bi



ÇED’ê nîne’ dan. Her wiha ÇED’ê jî çar demsalan lêkolîn û karên zanistî nekir û li gel vê yekê jib o çêkirina trîbunên HES’ê bersiva erênî da ku ev yek talankirina xwezayê ye. Li aliyê din kanên mermerê û metalên giran ên ji wan kanan bi baranê diherikin herêmê, di serî de cûreyên endemîk ên li herêmê, xaka qadê têk dibe. Ev yek bi tena serê xwe felaketeke ekolojîk e. Bi vê qanûnê re wê hîn bêhtir avahî bêne çêkirin. Ev yek jî tê wateya zêdebûna dagirkeriya li peravan. Tê wateya tunekirina peravan ku malê cemaweriyê ne. Li gorî min, eger ev qanûn nebûya, têkoşîna me ya hiqûqî wê zor bida wan. Yanî bi bikaranîna bi kontrol dikarin bi her awayî kirasekî li kiryarên xwe bikin. Em ê şopdarên vê mijarê bin.” ***ANF***



**Sebra Erebi Berxwedan’a Kurdıye**

Hafız Ahmet Turhallı

Hevok û gotarên ku di Qur’an a pîrozde hatine bikar anîn û ketina nav zimanên me, bi zanebun şaş hatine şîrovekirin û hêjî şaş tên şîrovekirin.

Ez dixwazim vêcarê gotina Erebî ‘SEBR’ şîrove bikim. Çend caran di Qur’an a pîrozde hatiye gotin, bi giştî çawa û bi kîjan wateyê zêdetir hatiye bikar anîn?

Sebr; bi hemu cureyên xwe 114 caran di Qur’anê de hatiye bikar anîn. Di Qur’an a pîrozde weke tê zanîn 114 Sure hene, bi gotinekî din, 114 caran Xwedayê mezin gotiye li berxwe bidin, daku hûn şkestinê nexwin.

Sabr: tiştên ku di jiyana mede çêbune an jî çêbibin, bê tirs û tevlîhevbunê, pêşwazî kirina wan e. Tiştê ku di jiyanekî normal de hêrs û lezbunê çêdike, lê tu bi eql û netevlîhevbunê pêşwazîya wî tiştî dikey. Bi şîroveyek zelaltir, li beramber tirs û têkçunê, dibin her şert û mercide berxwedana ruhî û laşîye.
Heta neha tiştê em ser vê gotarê pê dizanin, kê çi bi ser mede tîne bila bîne, em bêdeng bimînin. An jî vê rewşê wek çarenusê bibinin. Bi gotaraeke din divê tu rewşa heyî bipejirînî.
Ev şîroveya hanê ya desthelatdarane, ji bo ku mirov li mafên xwe negerin e.
Wek mînak: Dema Hz. Huseyn qetl dikin, dibêjin Xwedê desthelat kiriye qedera me. Têkçun û bindestî kirine çarenusa Hûseyn û alîgirên wî. Û gotin, hûn feqîrin, eva qedera weye, hûn birçîne eva qedera weye, hûn bindestin eva qedera weye, hûn nezanin ev jî qedera weye, li hember hemû zilm û zordariyan ‘sebr’ bikin ewê Xwedê mikafatê bide we. Li vê dinyayê nedabe we jî, ewê axîretê bide we. Ev gotine, wek gelekî gotin û pêkanînên din, ji naveroka xwe yekcarî hatiye durxistin û berovajî kirin.
Qur’an:
‘Ey gelî kesên bawerî anîne! Berxwebidin, di pêşbirka berxwedanê de neyarên xwe derbastir bikin, Hevdu bigrin bihevre kar bikin. Li beramber Xwedê bi hişmendiyekî bilind, xwe bi rêkûpêk bikin ku hûn bigîhîjin azadiyê.’ Alî-Îmran 200.
Ev ayet şîroveya Sebrê dike û dibêje, Sebr tê wateya Berxwedana bê hempa!
Em weke gelê Kurd, hejmara me zêdetirê pêncî mîlyonîne! Em ji hemû mafên xwe bêparin. Ji ber ku, di berxwedana me de qelsî heye, hinek ji me bi berxwdan û îradeyeke weke mucîzatan jiyan dikin. Hinek ji me jî, ji bo xwarin, vexwarin û jiyaneke nemirovî dijîn.
Divê gelî meyê oldar, ji oldarên dîtir xwe zanatir û rêxistintir bike, daku berxwedana me bigîhîje armanca xwe.
Rewşenbîr û nivîskarên me, di karûbarên xwede bi israr berxwe bidin, rê ronî bikin, daku millete me bikaribe ser wî rêya rewşenbîrî bimeşin.
Hunermendên me, hunerekî weha balkêş û bilind derxînin holê, bikaribin li cîhanê dengvebidin. Sîyasetmedarên me, sîyasetekî bi nirx pêşbixin, bikaribin yekrêziya mala Kurd ava bikin.
Leşkerên me weha jîhatî û serkeftî kar bikin ku cîhê navên we derbas bibe, cîhan bi rêzdarî pêşwazî bike.
Teknîsyenên me amuran wisa çekin ku, ne SÎHA yên tirkan, nejî Balafirên wan karibin ji asîmanan bifirin.
Divê em hemu bi berxwedanekê bêhempa karên xwe pir serkeftî bi cîh binin. Berxwedan xebat û tekoşîn, ewê azadiya milletê me û welatê me jî bixwe re biçespîne.

# Hikumet mûçe nade û yên nikarin pereyê elektrîkê bidin elektrîka wan qut dike

**Tenê di nava sê rojên borî de elektrîka 741 cihên bazirganiyê û pişesaziyê yên li devera Soran ji ber pereyê elektrîkê nedane hatiye qutkirin. Welatî diyar dikin ku hikumet di dema wergirtina deynên xwe de zîreke, lê dema dayîna paşkewta mûçeyên karmendan de bêdenge.**

Rêveberiya Belavkirina Elektrîkê ya Soran ji roja Pêncşemê ve dest bi birîna elektîrka hinek cihên bazirganiyê ku pereyê elektrîkê nedane û gelek pere deyndarin kiriye. Di pêngava yekem de destpêkê elektrîka cihên bazirganiyê qutkir û di pêngava duyem de elektrîka malan jî qutkir ku zêdetirî 1 miyon dînar deyndarin.
Berdevkê Rêveberiya Belavkirina Elektrîkê ya Soran Wefa Seîd di derbarê mijarê de ji Rojnews’ê re axivî. Wefa Seîd diyarkir ku hevbeşên elektrîkê yên li sînorê îdareya serbixwe ya Soran 92 milyar dînar deydarin û ji vê hejmarê 17 milyar dînar deynê cihên bazirganî, pişesazî û geştyariyê ne û got: “Bang dikin ku deynên xwe yên elektrîkê bidin. Eger pereyê deynên xwe nedin neçarin elektrîka wan qutbikin.”
Wefa Seîd di dewama axaftina xwe de destnîşan kir ku desthilata tam dane wan ku elektrîka hemû ew mal û cihên bazirganiyê yên ku deynên xwe nedane û guh nadin biryarên hikumetê bibirin û wiha anî ziman: “Hîna jî binpêkirin hene. Kesên ku bi awayekî ne fermî elektrîkê digirin û nebûne hevkarên fermî hene ku hejmara wan nêzîkî 3 hezar mal û cihanin. Ji ber wê hinek ji wan malan elektrîka wan hatiye qutkirin û hinek ji wan jî zext li ser hatine kirin û qeyda xwe çêkirine.”
Di derbarê qurkirina elektrîkê de welatiyên Soran ragihandin ku xwezî hikumet weke ku ji bo wergirtina mafê xwe de zîreke, di dayîna mafê xelkê de jî zîrek ba û bê xem nebûya. Her wiha daxwaz kirin ku hikumet li şûna qutkirina elektrîkê û xwestina deynên xwe, divê di berdêla paşxistina mûçe de deynê welatiyan





nestîne.
Yek ji welatiyên Herêma Soran Kemal Heynî ji ajansa me re destnîşankir ku ev hikûmetê li ser milê xelkê Kurdistanê tenê bargiraniye û wiha axivî: “Ji ber ku roj li pey rojê krîzan ji xelkê re derdixe holê û kiriya xizmetguzariyê zêdetir dike. Suprîza herî dawî ya hikumetê li beramber nedayîna pereyê elektrîkê qutkirina elektrîkê bû. Şermeke mezine ku hikumet elektrîka xelkê qut bike. Ji ber ku welatî mehane zêdetirî 50 hezar dînar dide kiriya elektrîkê. Ev jî nîşan dide ku hikumetê nekariye elektrîkê baş dabîn bike. Madem hikumet deynê xwe ji welatiyan werdigire, bila ew jî mûçeyê paşkevtî yê karmendan bide. Li hember mafê welatiyan bê xem nebe.”
Li gorî agahiyan wê di nîva meha Îlonê de destbi qutkirina elektrîka malan ku bi taybet malên zêdetirî 1 milyon dînar deynê elektrîkê hene, were kirin. ***ROJNEWS/***



# KCK: Êrişa li dijî hevrê Sûheyl Xûrşîd parçeyek ji qirkirina Kurdan e

KCK’ê da xuyakirin ku wê gelê Kurdistanê yê welatparêz bide ser şopa têkoşer Sûheyl Xûrşîd û xwedî li mîrateya wî derkeve û got, zêdebûna êrişan parçeyek ji qirkirina Kurdan e.

Derbarê êrişa ser, Endamê Desteya Rêveber ya Tevgera Azadî Sûheyl Xûrşîd, Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK’ê daxuyaniyek da KCK di daxuyaniyê de diyar kir ku bi destê ajan û nokerên dewleta Tirk a qirker, di 28’ê Tebaxa 2022’an de ji welatparêzên Başûrê Kurdistanê û endamê Konseya Rêveber a Tevgera Azadî Sûheyl Xûrşîd Ezîz hate qetilkirin û wiha got: “Em vê êrîşê şermezar dikin û lanetê li êrîşkaran tînin. Di şexsê welatparêzê mezin û têkoşer Sûheyl Xûrşîd Ezîz de şehîdên demokrasiyê û şoreşê bi rêz û minet bi bîr tînin, soza ku me dane şehîdên xwe ya ji bo xwedîderketina li bîranîna wan, dubare dikin.”

**’Dewleta tirkî ya dagîrker dixwaze hebûna kurdan ji holê rake’**

KCK’ê da xuyakirin ku têkoşîna Azadiyê ya Kurdistanê di pêvajoyeke krîtîk û dîrokî de ye û wiha got: “Gelê Kurdistanê zêdeyî sed sal in li dijî mêtingeriyê têkoşîneke bêhempa û dijwar meşandiye û bi dayina berdêlên giran destketiyên girîng bi dest xistiye. Dewleta Tirk ku li çar parçeyên Kurdistanê û li her devera Kurd lê ne, van êrîşan dike, bingehê xwe yê qirker radixe pêş çavan ku dixwaze hebûna Kurdan ji holê rake.”

**’Êrîşa li dijî hevrê Sûheyl parçeyek ji qirkirina Kurdan e’**

KCK’ê da zanîn ku ev êrîşa li hemberî welatparêzê Kurd ê mezin û têkoşer hevrê Sûheyl Xûrşîd Ezîz hate kirin, parçeyek ji komkujî û qirkirina li ser Kurdan e û wiha got: “Hevrê Sûheyl Xûrşîd Ezîz ku bi navê Mamoste Şemal tê naskirin, mirovekî mezin ê welatparêz û têkoşer ê gelê Başûrê Kurdistanê bû. Jiyana xwe di ber azadiya Kurdistanê re da û bû nûnerê xeta welatparêziyê. Li ser rêya şehîdan meşiya, li pey xwe mîrateyeke mezin a têkoşînê hişt û şehîd ket. Bêguman gelê Kurdistanê yê welatparêz wê bide ser şopa wî û xwedî li mîrateya wî derkeve.”



# HPG: 8 dagirker hatin cezakirin, derb li Skorskyekê hate xistin

**HPG’ê ragihand ku di çalakiyên tîmên bi tevger de 8 leşkerên Tirk ên dagirker hatin cezakirin, derb li helîkoptereke Skorsky hate xistin. Herwiha hat ragihandin ku dagîrkeran 15 caran bi bombeyên taktîk nukleer û çekên kîmyewî êrîş kirin.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê bi daxuyaniyek nivîskî ragihannd ku 8 leşkerên Tirk ên dagirker hatin cezakirin, derb li helîkoptereke Skorsky hate xistin herwiha da zanîn ku ji ber ku dagirkeran li hemberî berxwedana gerîlayan nekarîn gavekê biavêjin, 15 caran bi bombeyên taktîk nukleer û bi çekên kîmyewî êrîş kirin. Herwiha bal kişand ser kiryarênn PDK’ê yên ku ji bo dewleta dagîrker dibe dest û pê.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê derbarê çalakî û êrîşên hatine kirin ev daxuyanî da:

**Di çarçoveya Pêngava Şoreşger a Bazên Zagrosê de li herêma Avaşînê**

Di 29’ê Tebaxê de dagirkerên ku dixwestin li Qada Berxwedanê ya Werxelê rê çêbikin bûne hedefa hêzên me. Tîmên me yên bi tevger li kepçeyên dagirkeran dane. Piştî lêdana hêzên me dagirkerên li ser kepçeyan neçar mane, êrîşên xwe bidin sekinandin.

**Di çarçoveya Pêngava Şoreşger a Şehîd Savaş Maraş a Cenga Xabûrê de;**

Di 29’ê Tebaxê de dema ku dagirkeran xwestin ber bi çeperên şer ên li Şehîd Sîpan a Qada Berxwedanê ya Girê Amêdiyê werin, hêzên me dagirker xistine bin kontrola xwe. Hêzên me saet di 08.00’an de ji sê aliyan ve girtine ser dagirkeran. Milê yekemîn bi bombeyên destan û çekan li dagirkeran dane û 3 da-



girker ceza kirin. Milê duyemîn ê çalakiyê bi çekên şexsî li dagirkeran dane û 3 dagirker ceza kirin. Milê sêyemîn ê çalakiyê jî bi çekên giran li çeperên dagirkeran dane.
Di 29’ê Tebaxê saet di 16.10’an de tîmên me yên bi tevger ên YJA Starê li Qada Berxwedanê ya Girê Hakkarî bi sûîkastê li dagirkeran dane û li vir dagirkerek hatiye cezakirin.
Di 29’ê Tebaxê de saet di 21.10’an de bi taktîka sûîkastê li dagirkerên li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî hate xistin û dagirkerek hate cezakirin.

Di 29’ê Tebaxê de bi şev dema ku helîkoptereke Skorsky xwest leşkeran deyne Qada Berxwedanê ya Girê Amêdiyê hêzên me li helîkopterê dan. Hêzên me bi xurtî li helîkopterê dan û helîkoptera Skorsky neçar ma ji qadê dûr bikeve.

**Êrîşên artêşa Tirk a dagirker ên bi bombeyên nukleerî yên taktîkî û çekên kîmyewî;**

Di 29’ê Tebaxê de çeperên şer ên li Qadên Berxwedanê yên Girê Cûdî, Saca û Şikefta Birîndara 15 caran bi bombeyên nukleerî yên taktîkî û çekên kîmyewî hatin bombekirin.

**Êrîşên artêşa Tirk a dagirker;**

Di 29’ê Tebaxê de artêşa dagirker bi kepçeyan hewl da çeper û tunelên şer ên li Qada Berxwedanê ya Werxelê hilweşîne.
Di 29’ê Tebaxê de Qadên Berxwedanê yên Girê Amediyê û Kurojahro 23 caran bi helîkopterên êrîşê hatin bombekirin.
Di 29’ê Tebaxê de dron li ser Qada Berxwedanê ya Girê FM geriyaye.
Di 29’ê Tebaxê de Qadên Berxwedanê yên Girê Cûdî, Girê Hakkarî, Şehîd Adil, Sîda û Saca 13 caran bi balafirên şer hatin bombekirin.
Di 29 û 30’ê Tebaxê de Qadên Berxwedanê yên Girê FM, Şehîd Adil, Sîda û Saca bi dehan caran bi obus, hawan û çekên giran hatin bombekirin.
Hêzên PDK’ê xebatên vekirina rêya diçe ber bi Qada Berxwedanê ya Girê Amediyê ya bi armanca vekirina pêşiya dagirkeriyê didomîne. Hêzên PDK’ê û artêşa Tirk a dagirker bi hev re ewlehiya vê rêyê digirin û bi hev re tevdigerin.”


# Dewleta tirk qutkirina avê li dijî gel wek çek bikar tîne

Navenda Nûçeyan/Qamişlo

Dewleta Tirk a dagîrker qutkirina ava çemê Firatê li ser xaka Sûriyê didomîne. Dewleta tirk di van demê dawî de rêjeya avê kêmtir dike û bi payîzê re dibe sedema karesateke mirovî û jîngehê.
Ava gola bendava rojava zêdetirî 5 metreyan kêm bûye û nêzî ziwabûna bi temamî dibe ku êdî piştî wê bendav dê nekare karê xwe bidomîne. Ava Bendava Firatê ya li Tebqayê heta 4 metreyan daketiye.
Dewleta Tirk a dagirker bi awayekî vekirî û li hemû eniyan li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê şer dike. Ji bo dagirkirina xaka Sûriyê û dawî li hebûna gelên herêmê bîne, dewleta dagirker hemû hewldanan dike.

**Ava Çemê Firatê Weke Çek tê Bikarhanîn**

Dewleta Tirk di van salên dawîn de çemê Firatê veguherand çekeke şer li dijî herêmê, ew miqdareke mezin a avê li ser Sûriyê qut dike. Ev zêdetirî 4 salan e ku dewleta Tirk bi zanabûn 200 metrekab di saniyeyê de wek rêjeya navîn a ava çemê berdide xaka Sûriyê, lê di heman demê de Enqere û Şamê di sala 1987’an de li hev kiribû ku 500 metrekab derbasî Sûriyê bibe.
Ava gola Bendava rojava zêdetirî 5 metreyan kêm bûye û niha nêzî asta ziwabûnê dibe ku êdî wê demê jî karê bendavê raweste û dê gol jî di encamê de nemîne. Tenê metreyek maye ku bigihêje asta ziwabûnê, ev jî tê wateya



karesateke jîngehê û mirovî.

**Bikaranîneke Bi Zanabûn ya avê**

Bendava Rojava 17 saetan radiweste û hilberîna kehrebeyê disekinîne. Di vê demê de, kehrebe li tevahiya herêmê qut dibe. Paşê Bendava Firatê 4 saetan dixebite da ku kehrebeyê bide bajaran piştî qutkirina wê ji ser gundan. Piştre jî karê bendavan bi temamî ji saet 3’yê sibehê heya 4’yê piştî nîvro disekine.
Rêveberiya giştî ya bendavan neçar dimîne ku li ser vê bernameyê xebatê bide meşandin da ku gol bi temamî vala nebe û bi vî awayî ava vexwarin û avdanê peyda bike. Ji ber ku xebitandina bendavan bi tevahî kapasîteya wê ji bo hilberîna elektrîkê, dê golê di nava çend saetan de vala bike.
Hêjayî bîranînê heye ku ev kêmbûna avê dibe sedemê zêdebûna nexweşiyan jî û ev jî qirîza civakî kurtir dike. Lê disa jî li dijî sûcên şer yên dewleta tirkî ya dagîrker, cîhan ker û lal e.

# ‘PDK’ê ji bo berjewendiyên xwe dibe rêya qirkirina Kurdan’

Hediya Şemo diyar kir ku hevkariya PDK’ê bi dagîrkeriya tirkî re hebûna Kurdan dixe xeteriyê û got, divê gelê Kurd li herçar perçeyên Kurdistanê li dijî xiyaneta PDK’ê helwesteke xurt nîşan bidin

**Şaho Gabar / Qamişlo**

Ji 17`ê Nîsana ve, an ku piştî serdana serokê hikumeta Başûrê Kurdistanê Mesrûr Barzanî ya ji bo Tirkiyê, artêşa Tirk a dagirker bi beşdarbûna PDK`ê li Başûrê Kurdistanê êrişî qadên gerîlayan dike. Li hemberî êrişan gerîlayên HPG û YJA Starê, li herêmên Avaşîn û Metînayê berxwedaneke bê hempa didin meşandin û derbên giran li artêşa tirk ya dagîrker dixin. Ji ber têkçûna dagîrkeriya tirkî li herêmên parastinê yên Medya, PDK’ê bi vekirina riyan li qadên gerîlayan dixwaze dorpêçê li ser gerîlayan ferz bike û artêşa Tirkan ji têkçûnê xelas bike. Li hemberî kiryarên PDK’ê, beriya sê rojan NPG’ê bi riya daxuyaniyekê hişyarî dabû ku PDK’ê dixwaze şerekî navxuyî derxe û divê dest ji hevkariya bi êrişên dagîrkeriyê yên ser qadên gerîlayan berde.

Derbarê hevkariya PDK’ê ya bi dagîrkeriya tirkî re û xetera wê li ser tevayiya Kurdistanê, Endama Koordînasyona Yekîtiya Jinên Êzidî ya Rojava Hedeya Şemo ji me re axivî.

Hediya Şemo diyar kir ku ji destpêka damezrandina Tevgera Azadiyê ve, PDK’ê bi awayekî eşkere hevkariya dewleta tirkî ya dagîrker kiriye û wiha got: “Dewleta tirkî ya dagirker di demên dawiyê de li herêmên Parastinê yên Medya derbên giran ji şervanên Azadiyê xwarin û gelek leşkerên wê hatin kuştin. Ji bo ku şikandina xwe ya li çiyayên azad veşêre, êrişên xwe yên ser Rojava yên bi balafirên bêmirov zêde kirin û welatiyên Rojava kirin armanc. Dewleta tirkî ji bo ku bihêsanî Rojava , Şingal û Başûrê Kurdistanî dagîr bike, bi tevayiya hêz û çekên qedexekirî êrişên ser qadên gerîlayan dewam dike. Lê Ji ber ku dewleta tirkî li hember berxwedana gerîla têkçû, wek çareke din PDK bi xwe re tevlî şerê gerîla kir. PDK’ê jî ji destpêka damezrandina Tevgera Azadiyê, rê ji tirkan re vekiriye û alîkariya wan kiriye.”

## ’PDK’ê di diroka xwe de xeta xiyanetê hilbijartiye’

Hedeya Şemo da da xuyakirin ku PDK’ê ji destpêka dîroka xwe ve xeta xîyanete hilbijartiye û wiha got: “PDK’ê Her dem li pêşiya artêşa tirkî meşiyaye û rê nîşanî wê daye. Di êrişên dewleta tirkî yê dawî de jî, hevkariya PDK’ê bi dagîrkeriyê re ji her kesî re eşkere bûye. Îro bi vekirina riyan li pêşiya artêşa tirkî li qadên gerîlayan, PDK’ê rûyê xwe yê xîyanetê disa eşkere kir. Dema ku serdan di navbera berpirsên PDK’ê û rayedarên Tirkiyê de çêdibin, dewleta tirkî êrişên xwe yên ser qadên gerîlayan zêde dike. Xete berxwedanê û xeta xîyanetê ji gelê kurd re zelal bûye. Lê her dem xeta xîyanetê bin ketiye û wê bin bikeve.”

## ’Gerîlayên azadiyê xeta parastina tevayiya Kurdistanê ne’

Hediya bal kişand ser têkoşîna Tevgera Azadiyê û axaftina xwe wiha domand: “Eger ne ji têkoşîna gerîlayên azadiyê ba, wê Tirkiyê Kurdistan bi giştî xistiba bi dagîrkeriya xwe de. Gerîlayên azadiyên û Herêmên parastinê yên Medya, xeta parastina tevayia Kurdistanê ne. Tirkiyê ji bo ku bi hêsanê bakur û rojhilatê Sûriyê, herwiha Başûrê Kurdistanê bi giştî




dagîr bike bi tevayiya hêza xwe êrişî gerîlayan dike.”

## ’Wê PDK’ê dawiya xwe bîne’

Hedeya da zanîn ku hevkariya PDK’ê bi dagîrkeriya Tirkiyê re wê dawiya wê bîne û wiha dirêjî da xaftina xwe: “Wekî di dîmanan de hat eşkerekirin, dewleta tirkî ya faşîst ji ber têkçûyîna xwe, bi çekên nûkleerî êrişî qadên gerîla dike. PDK’ê dixwaze wan ji şkandinek mezin xelas bike û ji wan re riyan li qadên Gerîlayan vedike. Hevkariya PDK’ê bi Tirkan re wê dawiya wê bîne. Ji ber ku di dîrokê de her dem xayîn têk çûyine. Ji ber şervanên azadiyê tevayiya Kurdan temsîl dikin, PDK’ê rê ji Tirkan re vedike û alîkariya dijmin dike, bi vê kirina xwe eşkere dike ku ji bo qirkirina gelê kurd xwe dike çareya dijmin. Tişta ku dewleta tirkî nikaribe bike, PDK’ê dike. Kurmê darê ji darê ye.”

## ’Divê gelê Kurd li hemberî xiyaneta PDK’ê dengê xwe bilind bike’

Endama Koordînasyona Yekîtiya Jinên Êzidî ya Rojava Hedeya Şemo, da zanîn ku dewlete tirkî ya dagîrker dixwaze bi riya PDK’ê Kurdan qir bike û axaftina xwe wiha qedand: “Dewlete tirkî ya dagîrker dixwaze bi riya PDK’ê şerê Kurdî – Kurdî derxe û kurdan qir bike. PDK’ê ji bo berjewendiyên xwe yên malbatî û aborî kurdan dike qurban. Gelek caran PDK’ê hewil da ku şerê birakujî derxe, lê gerîlayan rê li pêş pilanên wê digirtin. Divê gelê kurd li her çar perçeyên Kurdistanê li dijî xîyaneta PDK’ê bisekinin û wê hişyar bikin. Projeya Tirkiyê dagîrkirina Rojava û başûrê Kurdistanê ye û li hemberî wê divê kurd hişyar bin û ji PDK’ê re bêjin, ‘êdî bese ji xîyanetê re’. Em bang PDK’ê dikin ku dest ji xîyanet berde û gelê kurd neke qurbana berjewendiyên xwe.”



## Dost ji Erdogan re tune ye!

**DILYAR CIZÎRÎ**

Gelê Sûriyê piştî buhara gelan a ji Tunisê destpê kir, ji bo guhertina demokratîk hêvî ava kirin û dest bi xwepêşandan û çalakiyên li dijî rêjîmê kirin. Hikûmeta AKP/MHP’yê bi serkêşiya Erdogan ji destpêka aloziyê ve destê xwe avêt tevgera gel û xwest ji bo xewin û xeyalên xwe yên “Mîsaqa Milî” xaka Sûriyê dagir bike.

Destdirêjiya Erdogan û hevkarên wî bû sedema derketina tevgerên çekdarî û şer li seranserî Sûriyê belav bû. Di encamê de zarok jî di nav de bi sedhezaran welatiyên Sûriyê jiyana xwe ji dest dan û bi milyonan koçber bûn. Di wê navberê de Erdogan bi hemû awayî komên çekdar pêş xistin û piştgirî da wan.

Di ser wan re û di bin navê opozisyonê xwest xaka Sûriyê dagir bikin. Erdogan xwe wekî bavê opozisyonê nîşan da û bi dehan xetên wî yên Sor di Sûriyê de derketin. Erdogan dema dît gelê Kurd sîstemê ava dike û pirojeyên wî têk dibin, berê çeteyên xwe da herêmên Bakurê Sûriyê û bi her awayî li dijî wan şer kir. Di wir de û ji bo têkbirina destkeftiyên herêmê gav bi gav paş de avêtin û opozisyona xwe radestî hikûmeta Şamê û hevkarên wê Rûsiya kirin.

Ev bi civînên Astana destpê kirin û heta niha jî dewam dike. Di van rojan de êdî behsa lihavhatina di navbera Hikûmeta AKP/MHP’ê û Hikûmeta Şamê tê kirin. Ew hikûmeta Erdogan serokê wê Beşar El-Esed wekî kujer pênase dikir, îro dixwaze pê re lihev were. Lihevhatina wî jî tê wateya gaveke din a têkbirin û firotina çeteyên navê opozisyonê li wan dike.

Li gorî tê xuyakirin di civîna Tehran a di navbera Pûtîn, Reiyîsî û Erdogan de ji Erdogan hatiye xwestin destê xwe ji çeteyên xwe yên navê “Opozisyonê” li wan dike berde. Devjê berdana wan tê wateya pêvajoyek nû di asta dosya Sûriyê de. Ji xwe devjêberdana çeteyan li Erdogan ne tiştekî nûye, ev rewş ji sala 2018’an destpê kiriye, dema çete ji başûrê Şamê beranberî dagirkirina Efrînê dan derxistin.

Diyare niha jî wê yek ji rêzezincîrên firotina Erdogan ji çeteyên girêdayî xwe ye. Lê vê carê rewş zêdetir metirsîdar e, çeteyên çekdar û aliyên wan ên siyasî wê li kur werin bi cihkirin. Ev çeteyên bi salane fêrî talan, rijandina xwînê û kuştinê bûne, gelo wê ber bi ku ve werin şandin. Li aliyê din jî nûnerên wan ên siyasî yên li Stenbolê rûniştîne wê ber bi ku ve werin şandin.

Ev rewşa “opozisyona Sûryê” ya çêkirî ku bi destê Erdogan hatiye avkirin ber bi çarenûsa ne diyar ve dibe. Bê guman ev rewş di heman demê de wê ya ENKS’ê be jî. Dê rewşa wan iflas û çûyîna ber bi hilweşînê ve be. Di rewşeke wiha de ji Rêveberiya Xweser û Meclîsa Sûriyaya Demokratîk (MSD) tê xwestin bi hestyarî nêzî van mijaran bibe û karibe kesayet û komên gel ên welatparêz ku bi Erdogan hatibûn xapandin, kom bikin û wan ber bi xeta çareserî û demokarsiyê ve bikşînin.



# ’Nebe hevkarê dagîrkerê xaka xwe’


Luqman Jaro diyar kir ku armanca êrişên dagîrkeriya tirkî şkandina baweriya gelên herêmê ye û got, divê rejîma Şamê nebe hevkarê dagîrkerê xaka xwe.

**Mihemed Xanim /Heleb**

Ji destpêka şoreşa Rojava ve dewleta tirkî ya dagîrker bi riya çeteyên DAIŞ’ê êrişî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dike. Piştî têkçûna DAIŞ’ê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Tirkiyê êrişan bi xwe pêk tîne. Dewleta tirkî û çeteyên wê di dema êrişên dagirkeriyê yên li ser Serêkaniyê, Girê Spî û Efrînê de bi dehan komkujî li dijî sivîlan pêk anîn e. Niha jî bi riya êrişên bi balafirên bêmirov welatiyan dike armanc. Civaka navneteweyî bêdengiya xwe li hember komkujiyên li ser welatiyan dewam dike. Li ser gef û êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser herêmên Rêvberiya Xweser, Endama Meclisa Giştî ya Partiyaa Yekîtiya Demokratîk( PYD) Luqman Jaro ji me re axivî.

## ’Dagîrkeriya tirkî têkbirina îradeya gelên herêmê dike armanc’

Luqman diyar kir ku êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê ne tiştekî nû ye û wiha got: “Ev deh salin ku êrişên dagîrkeriya tirkî yên ser herêmê dewam dikin, her dem şêwazên êrişên xwe diguherîn e. Ev demeke ku dagîrkerî bi riya balafirên bêmirov êrişî bakur û rojhilatê Sûriyê dike. Dagîrkerî bi balafirên bêmirov



welatî, kesayetên welatperwer û berxwedêrên Rojava dike armanc. Dagîrkeriya tirkî dixwaze bi riya armancgirtina pêşengên Rojava Rêveberiya Xweser Pûç bike. Li hemberî van kiryarên nemirovî, hêzên navneteweyî xwe bêdeng dikin.”

## ’Hêzên navneteweyî hevkarên rijandina xwîna gelan e’

Luqman da xuyakirin ku hêzên navnetewî ji bo berjewendiyên xwe yên aborî çavê xwe digirin û li hemberî kiryarên dewleta tirk ya dagîrker, xwe bêdeng dikin û wiha dirêjî da axaftina xwe: “ Dewleta faşîst ya tirk dixwaze pirsgirikên xwe yên hundir derxe dervî sînorê xwe. Tevî ku dagîrkeriya tirkî her roj komkujiyan pêk tîne jî, Rûsya û Emerîka ji bo berjewendiyên xwe yên aborî xwe bêdeng dikin. Ango ev hêze ji bo berjewendiyên xwe biparêzin, gelan dikin qurban. “

‘Dive rejîma Şamê bi hêza ku xaka wê dagîr kirî li hevkirinê qebûlneke’

Luqman balkişand ser lihevkirina di navbera Hikumeta Şamê û dagîrkeriya tirkî û wiha got: “Di dema dawî de rejîma faşist ya AKP’ê û MHP’ê dixwaze bi rêjîma Şamê re têkiliyan girê bide û çeteyên ku heya niha emelên wî pêk dianîn, radestî rêjîma Sûrî bike. Li beramberî wê ji rêjîmê dixwaze ku alîkariyê di şerê wê yê li dijî Rojava de bike. Bi embargoya nû ya ku rêjîma Sûriyê li ser herêma Şehba ferz dike, tê xuyakirin hin lihevkirin di navbera Şam û Enqera de çêbûye. Lê hikumeta Şamê baş dizane ku yê nehiştî dewleta Sûriyê birûxe, Rêveberiya Xweser bû. Ji ber ku wê li hemberî çeteyên dewleta tirkî li ber xwe da û planên wan yên perçekirina xaka Sûriyê têk birin. Divê Hikumeta Şamê bi QSD’ê re lihevkirinê çêke ne bi hêza ku xaka wê dagîr kiriye re.”

## ’Rêxstinbûna gelên herêmê wê şikandina dagîrkeriyê tekez bike’


Endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk( PYD) Luqman Jaro Ji gelên herêmê xwest ku xwe ji şerekî dirêj re amade bikin û axaftina xwe wiha qedand: “ Dewleta Tirkiyê ya dagîrker bi riya Sîxûr û xaînan dixwaze rêveberiya xweser ji hundir ve pûç bike. Lê bi rêxistinkirina gel siyaseta wê



têk diçe. Pêwêste gelên herêmê hişyar bin û ji bo cezakirina sîxurên dewleta tirkî ya dagîrker destekê bidin hêzên ewlekariyê.Tiştê tê xwestin divê em xwe amade bikin ji şerekî dirêj re, dibe ku bi salan dirêj bike. Ji her kesî tê xwestin ku li gorî erkê demê tevgerê bike û tevlî berxwedana gelan bibe. Herwiha divê hikumeta Şamê dest ji zihniyeta şofînîst ya li dijî kurdan berde û nebe hevkarê dewleta tirkî ya dagîrker.”

## Tirkiye navendbûyîna xerabiyan didomîne

**Zekî BEDRAN**



Erdogan carekedin gotina xwe ya, `herêma bi kûrahiya 30 km. di nava sînorê Sûrî dagirbikin û bixin bin kontrolê` dûbare kir. Wekî ku meydan xwendinê got, ‘vaye careke din ji hemû cîhanê re eşkere dikim.’ Di civîna gîştî ya NY`de planê xîzkirina nexşeya Sûrî dane nîşandan, bûyerek ne ji rêzê bû.

Diyare ku, endamên rêveberiyê Tirkiyê ev pîlanê pir alî, nîqaş kirine û weke siyaseta dewletê diyar kirine.

Sedemê ew kas bê şerm tevgerîna Tirkiyê mijara nîvîseke din e. Lê eşkereye ku piştgîriya xwe ya esasî ji hêzên wek NATO`yê digre. Ji ber ku pîlana dagirkeriyê dema carekedin eşkere kir, sekreterê gîştî yê NATO`yê Stoltenberg jî carekedin got,``fikarên Tirkiyê yên ewlekariyê, divê ciddî bên girtin``. Pir eşkereye ku fikarên Tirkiyê yên ewlekariyê nînin. Li Sûrî artêşê Kurdan nînin, hêzê wan yê esmanî û yekîneyên wan ê zirxî nînin. Kurd tenê yek tiştek kirine, li hember DAİŞ`ê şer kirine. Ev şerê jî, bi dewletên endamên NATO yê ku weke hêza hevpeymanî di berxwedana Kobanê`de cîh girtibûn, kirine. DYE û dewletên endamên NATO’yê şahid in ku ji aliyê Sûrî ve ti êriş li ser Tirkiyê çênebûne.

Faşist Erdogan û Bahçeli ji bo Kurd nebin xwedan statû, li Sûrî bi DAİŞ û El Qaide`re îttîfaq kirin. Berê van hêzan dan Kurdan. Îttîfaqê wan heta niha didome. Piştî ku bi van hêzan re encamê ku dixwast bi dest nexist, bi artêşa xwe dest bi dagirkirina erdê Sûrî kir. Ji destpêkê heta niha Sûrî kişand nava gerînokekê. Mesûliyeta sereke ya xirabûna vî welatî û derketina encamên pir tirsnak Tirkiye ye.

Piştî ku Tirkiyê balafira Rûsî xist, ket nav tirseke mezin de. Eger Rusya alîkarî bide PKK’ê û li hember Kurdan dijminayî neke wê çawa be? Ev îhtîmal xewna wan revand û bi lez û bez xwe avêtin ber lingê Rusya. Tirkiyê bi qasî ku hemû dîroka osmaniyan nehatiye dîtin, tawîz dan Rusya. Bi qasî ku, weke dewleteke endamê NATO`yê ji Rusya fuzeyên S-400 bikire, gav pêşde avêt. Ev fuzeyan, rolekî ku di parastina Tirkiyê`de bilîzin tinebû. Ne îhtîmaleke êrîş kirina dewletên cîran yê Tirkiyê hebû, ne jî hêzeke wan hebû. Kirîna van fuzeyan hember dagirkirina herêmên weke Efrîn wek rûşwet hat dayîn. Herwiha Tirkiyê bi NATO û DYE re hember hev hatin, heya astekê girte ber çavan. Ji ber vê jî ji projeya balafira herî pêşketî F-35 hate derxistin. Rûxmî vana hemûyan Stoltenberg carekedin jî weke papaxan gotina ``fikarên tirkiyê ya ewlekariyê`` dubare dike. Rêveberiyê Erdoxan weke ga yê dîn bi çekên NATO`yê êrîşê başur û rojava dike. Lî tirkiyê bi hezaran Kurd di girtîgehanda ne. erdnîgariya Kurd tê xerakirin û şewitandin. Tenê rojek yên weke Stoltenberg li ser hebûn û ewlekariya Kurdan daxuyaniyek nehat. Wiha tê fêmkirin ku ji bo wan dewleta tirkan hebûneke xwedayiye. Kurd her tim ji bo vê hebûna xwedayî dikare bê qurbankirin. Ji peymana Lozan’ê heta niha qirkirina ku li ser Kurdan tê meşandin têrê nekiriye, yên weke Stotenberg piştgîriyê xwe ji bo faşîstê Erdoxan didomînin. Erdogan niha dide xuyakirin ku, ji bo hevdîtinan bi rêveberiyê Sûrî`re bikin amade ne. Eger xerabiyê ku li Sûrî kirine hinek jî bên sererastkirin û lêborînê bixwazin, dibe. Lê xem a Erdoxan ne eve. Artêşa tirkan, bi DAİŞ, El Kaide û çeteyên ku li dora xwe komkiribûn re, nedikarî qirkirina Kurdan bigîhîne encamê. Artêşa tirkan niha jî li îdlîb`ê parêzvaniyê El-Nusra yê dike. Hemû herêmên hatine dagirkirin de, qirkirina netewî didome. Li van herêman bi tû awayî Kurd nikarin jiyan bikin. Niha yek sedemeke hevdîtinê wan bi Esed re heye; ew jî tasfiye kirina Kurdan e. Bi hewldanê din re ev tasfiye pêk hatibaye, bi rêveberiya Esed re pêwîstiya hevdîtinê nedidîtin. Dewleta tirkan ji bo xêr a Sûrî hevdîtin nake. Bi şirîkayiya Şam`ê dixwaze Kurdan ji holê rake. Yani dixwaze li Sûrî zemîneke dijminayiyek û şerek nû ava bike. Heta niha bi kasî ku ji destê wî hat hember rêveberiya Şam`ê xerabî kir. Lê nekarî rêveberiya Esed li ser hikûm bixîne. Rojava jî rûxmî her tiştî berxwe da û li ser piyan ma. Niha dixwaze bi rêveberiya Esed re li hev bike û Kurdan tûne bike. Yanî ji bo li Sûrî şer xelas bibe û aşîtî pêk were, kar nake. Berovajî vê, rêya şerekî nû û dijminayiyeke nû dixwaze veke. Hewldanê Tirkiyê gelê Kurd bi gîştî fêm dike, dizane. Ji ber ku 50 salin bi êrîşên vê dewletî û bi lîstokên wî û bi xerabiyên ku birêxistin kiriye ve mijul dibe. Lê niha rêveberiya Erdogan û Baxçelî asteke pir xeterde ne. Li Tirkiyê hilbijartin nîzîk dibe. Di rewşeke asayî de îhtîmala bi serketina Erdogan nîne. Ji ber wî dixwaze şer belav bike û encam bigre, wiha dixwaze rêveberiyê xwe misoger bike. Li başur ji meha Nîsanê heta niha, êrîşeke giran dimeşînin. Çekên qedexekirî, çekên kîmyayî jî têde her tişt tê bikaranîn. Lê berxwedana gerîlla didome. Ji ber ku ew dixwazin li Rojava çîrokeke serkeftinê derxin, serî li Rusya dan û ger pêwîst be wê bi Esed`re jî li hev bikin. Divê li hember bûyerên nû yên li Sûrî yên bi xwîn bê sekinandin. Hember êrîşên dagirkeriyê, gelên Sûrî û hêzên demokrasî ya cîhanê, divê bi berxwedan bersiva wan bidin û dersekê bidin wan.